

Agahiyên li bara venêrîna hevbeş a daneyan

“Pergala agahiyên muqatebûnê & arîkariyê”

li gorî madeya 13 û 14 ya Rêzikên Giştî yên Parastina Daneyan (DSGVO)

Nav û Hûrgiliyên pêwendiyê yên kontrolkarî:

Bundesamt für Fremdenwesen und Asyl (Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye)
Modecenterstraße 22, 1030 Wien
Tel: +43- 59 133 98 7004
Faks: +43- 59 133 98 7399
e-name: BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at

Hûrgiliyên pêwendiyê yên berpîrsê parastina daneyan:

Tel: +43- 59 133 98 - 0
e-name: BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at

Armanca venêrîna bo daneyên ferdî bi vê mebestê ye:

Venêrîna hevbeş a daneyên ferdî divê ji aliyê Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye, daîreyên parêzgehî yên diyarbûyî bo muqatebûna biyaniyên li gorî madeya 2, benda 1 ya Lihevkirina Muqatebûn û Xizmetên Bingehîn û Wezîrê Federal ê Hundir ve were muqatekirin.

Bingeha qanûnî bo venêrîne:

Madeya 8 ya Peymana Federal li bara Pêkanîna Muqate û Xizmetên Bingehîn bo Penahxwazan û Biyaniyên din ên Xwedanşert ya 2005 (GVG-B 2005) têkildarî Lihevkirina Muqate û Xizmetên Bingehîn li gorî madeya 15a ya Peymana Destûra Federal (B-VG)

Dirêjahiya dema ku agahiyên ferdî yê werin xwedîkirin:

Du salan piştî kutabûna dema naveroka muqate û xizmetên bingehîn, ev dane tîna pakkirin bi mercê ku ev yek bo kiryareke nêzîk bi armanca cîwarkirinê li gorî madeya 11 ya Lihevkirina Muqate û Xizmetên Bingehîn pêwîst nebe.

Desteya kesên daneyên ferdî werdigirin:

dezgehên mirovdostane, dêrên dînî yan taybet yên ji aliyê Federasiyonê yan Parêzgehên Federal va diyar bûne; dezgehên berpîrsên naveroka sûdên herî kêr yên ezmûnên-amûran; Xizmetên Giştî yên Karpeydakirinê yên Avûstryayê (AMS); dezgehên ewlehiya civakî; rayedarên bacê; rayedarên deverî yên îdarî wekî rayedarên tenduristiyê; rayedarên ewlehiyê; rayedarên rifaha ciwanan; Binyada Têkelbûna Avûstryayê; Daîreya Komîsaryaya Bilind a NY bo Penaberan li Avûstryayê; rayedarên koçberî û penaberîya biyaniyan; pêkhînerên cihdayînê yên ku dê bo saziyan kar bikin (bi pêkanîna muqate û xizmetên bingehîn diyar bûne); kompaniyayên diyarbûyî yên veguhestinê bo veguhestina biyaniyan ku pêdiviya wan bi piştevanî û parastinê heye ka kî dikare piştevaniyê wergire (penahxwaz, kesên xwedan şertên penaberiye, kesên cihguhestî, kesên din ên ku nikarin ji ber hokarên heyî yan qanûnî werin paşvegerandin); Rayedarên Tomarkirinê yên ÇavkaniyaPIN li gorî pîvanên diyarbûyî li Peymana Dewleta-E; Amara Avûstryayê.
Venêrînerên ku (li madeya 4, mijara 8 ya DSGVO bi rêz madeya 36, beşa 2, mijara 9 ji Peymana Parastina Daneyan (DSG)) diyar bûye:

Wezîrê Federal ê Hundir; IBM Österreich - Internationale Büromaschinen Gesellschaft m.b.H.; Microsoft Österreich GmbH; Bundesrechenzentrum GmbH; Atos IT Solutions and Services GmbH

Mafên mijara daneyan:

Heqê gilîkirinê li Rayedarên Parastina Daneyan a Avûstryayê (1080 Wien, Wickenburggasse 8, tel +43 1 52 152-0, e-name dsb@dsb.gv.at) li gorî madeya 24, benda 1 ya Peymana Parastina Daneyan bi kar tê (DSG).

Heqê dest gihîştinê li madeya 15 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê sererastkirinê li madeya 16 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê pakkirinê ('heqê jibîrbûnê') li madeya 17 ya DSGVO diyar bûye.

Tu heqê itirazê li gorî madeya 21 DSGVO tuneye û tu heqê kêmsînorkirina venêrînê li gorî madeya 18 ya DSGVO (madeya 8, benda 4 ya Peymana Federal li bara Pêkanîna Muqate û Xizmetên Bingehîn bo Penahxwazan û Biyanîyên din ên Xwedanşert ya 2005 (GVG-B)) nayê pêkanîn.